

BILA KONSPÎROLOGÎ JI KONSPÎROLOGÎYÊ R'A BIMÊNE, LÊ DIVÊ NEYÊ JIBÎRKIRIN, KU KESEKÎ ZANIST BETAL NEKIRYE!¹

JI ALÎYÊ R'ÊDAKTSÎONÊ VA. – *Van demên dawîyê xwendevanên me jêderka (link) nivîseke di întêrnêta da ji me r'a şandibûn û t'ika kiribûn, ku em wê şirove bikin, an jî, wê çêtir bibûya, ewana nivîsbû, eger me ew li ser r'ûpelên r'ojnameya xwe biweşanda, helbet, eger em wê hêja bibîn.*

Ew gotar a K. Îsayêv bû, ya bi sernivîsa “Silavî û k'urd: gelên bi dîroka hevbeş û mak-zamînanê giştî ne! K'a, em binihêrin”²

Piştî ku endamên şewra r'êdaksîonê ew nivîs xwendin, r'êzek pirsan r'û dan, û dijar bû, biryarekê bigirin, k'a ji wir û pêva çî bikin: ew tiştê e, dema mirov bi xwesteka xwe di întêrnêta da nivîsekê diweşîne, lê lap tiştêkî dinê ye, eger mirov heman nivîsê li ser r'ûp'elên r'ojnameyê biweşîne. Lewra jî biryar hete dayîn, ku dê çêtir be, jî bo vê pirsê bi pisporan bişêwirin. Ji bo wê em berbirî zimanzan Ezîz ê Cewo Mamoyan bûn, ku ew nêrîna xwe ji bo wê nivîsê bide. Mamosta Ezîz ê Cewo xudanê berhema zînistî ya “T'aybetmendiyên r'êzimanî yên navdêr û bingehên destpêkî yên mak-zimanê hindewropî di k'urdî da”³ ye. Û di vê p'irtûka mamosta da wisa jî di derbarê vê mijarê da nixandin hene .

R'êzdar Ezîz ê Cewo t'ikaya me p'ejirand, û piştî demekê nixandineke balk'êş di derbarê vê mijarê da ji me r'a şand, a ku me bi spasdarî wergirt û pêşkêşî bala xwendevanên xwe dikin.

“K'urdîstana azad”

Di sêrî da divê bê gotin, ku îro p'eydabûna nivîsên vî r'engî di medya civakî da bûye tiştêkî di r'êzê da. Heya mirov dikare bibêje, ku, her çiqas ewana bi nak'okî ne, lê dîsa jî carana heyra r'adeyekê r'ola tiştêkî mîna katalîzatorê pêk tînin. Lewra jî, dibe ku, divê mirov wana bê baldarî nehêle: ma ne, ew jî r'engekî helwestê ye li hember pirsên heyî, bila ew li ser bingeha hîsên kesî an jî k'oc'ektîya (fehlvekirina) konspîrologî bin.

Waha, derdorê 190 xwendevan ji bo vê nivîsê şirove û nixandinên xwe hiştine. Lê bi giştî çiqas ew xwendine? Ev di derbarê çî da dibêje? Dyar e, ku pirsê t'êk'îlyên çandî, zimanî û dîrokî yên k'urd û r'ûsan ji bo p'ir'ek xwendevan balk'êş e – ji bo

¹ Ev gotara di hejmarê r'ojnameya «Свободный Курдистан»// “K'urdîstana azad” a 10 (215)-an da hatye weşandin (r'ojname di Moskovayê da bi zimanên r'ûsî û k'urdî r'onahî dibîne), û, ji ber ku hem nivîsa mijara gotinê, hem jî berhemên zanistî bi r'ûsî bûne, gotar jî bi r'ûsî hatibûye nivîsîn.

Wergera k'urdî – ya “K'urdîstana azad”.

² <https://zen.yandex.ru/media/id/601ea9f49c16c14bc7a2920d/slaviane-i-kurdy-narody-s-obsciei-istoriei-i-obscim-praiazykom-razbiraemsia-60cf581daa9d6d211632639e>

³ А. Д. Мамоян, Грамматические категории существительного и основы индоевропейского праязыка в курдском. Издательство Санкт-Петербургского университета – 2007 г.// А. Мамоян, Т'aybetmendiyên r'êzimanî yên navdêr û bingehên destpêkî yên mak-zimanê hindewropî di k'urdî da. Weşangeha zanîngeha Sankt-Pêtêrbûrgê – s. 2007.

hinekan her li ser asta zanebûnê, ji bo yê dinê, li ser asta r'avekirina têngihîştina pirsê ji hêla heşmendîya pêkhatina gelan ya dîrokî va, ango ji hêla zanista dîrokî va! Û li vira girîng e, k'a pisporên zanistê dê çi helwestê li hember daxwezên weha yê civakê bidin xuyan.

Lewra jî, hem helwest û dîtînen Îsayêv ên li hember r'astîyên dîrokî, hem jî şiroveyên xwendevanan ên ji bo wê nivîsa wî ji bo lêger'înên pêşer'ojê divê wek hinek qinyatên dinê yê pêvekî bên nixandin.

Di jîyanê da carna wisa dibe, ku p'eydabûna nixandineke weha, ya ku li ser bingeha hîsên kesî an nihêr'andinên k'oç'ekî yê konspîrologî ava bûbe, dibe sedem, ku lêger'îner bala xwe bidin t'erefên têngihîştina pirsê yê dinê yê derzanistî jî. Û lewra jî, ji vir û pêva ev t'erefên dîtîne (aspêkt) jî dikarin bên nixandin – ew çiqasî jî bi nak'okî an jî konspîrologî bin.

Ev, bi giştî, ji bo wê, k'a mirov divê bi çi ç'avî li vê pirsê binihêre!

Lêbelê, ji bo r'ast têngihîştina eytîya r'astîna pirsê, divê ew aspêktana, yê ku di wê nivîsa navborî da hene, di nava goveka zanistî da bên nixandin, bi taybet jî, dema pirs di derbarê têk'îlyên zimanî da ye. Lewra ku, ziman bi xwe, bi wî şewazê xwe yê xwezayî va, sistemek e, û di wê da her tişt li ser asta heşmendîyê bi hev va girêdayî ne, wek ku di mat'ematîkê da. (Dibe ku lewra jî di dîroka pêşveçûna zimanzanîyê da şaxekî wê yê “Zimanzanîya mat'ematîkî” derk'etîye holê).

Lewra jî, ji bo ku mirov di nivîsa navborî da ji bo wan pirsan, ên ku dertên holê, bersîvên heşmendî bibîne, divê wan di nava goveka wan prînsîp û kevneşopîyên zanistî da, û li ser bingeha destanînen zanista di derbarê zimên da binixîne, yê ku di encama pêşveçûna zamanzanîyê ya sedê salan da pêk hatine...

Û ji bo ku hem lêytmotîva nivîsîna wê gotarê, hem jî wat'eya wê tê bigihîjin, divê mirov nêr'îna xudanê wê nivîsê bi xwe hilde ber çavan, k'a ew bi xwe helwesta xwe ya li hember vê mijarê çawa têdigihîje. Va ew: di destpêka nivîsa xwe da Îsayêv li xwe mukur'tê: “...*Ez hez nakim, xwe konspîrolog hîs bikim, lê di weşana îroyîn da nikarim wê erkê pêk neynim*”. – Û di dawîyê da jî ew sedemên ku ew berbi konspîrologîyê va def andîne, weha r'avedîke: “... *Û bila delîlên ku min anîne bingeheke xwe ya danayî nînbîn jî– ew hîskirina min a hindur'în a sûbyêktîv e*”. – Hema wisa!

Helbet, carna hîskirina hindur'în a sûbyêktîv di k'arê têngihîştin an wat'edarkirinaa tiştêkî da heya r'adeyekê piç'ekî r'ola xwe heye, lêbelê, her t'enê piç'ekî û her t'enê heya r'adeyekê.

Lê di heman demê da, ji bo wê, ji bo ku mirov bikaribe r'astîya pirsên dîroka hevbeş û mak-zimanê giştî yê slavîyan û k'urdan ji bo xwe zelal bike, lêger'ênên zanistî yê dyar li hole hene, û, wek ku ji nivîsê tê xuyan Îsayêv bi xwe jî bi wana r'a ne t'enê nas bûye.



Bala xwe bidinê, hê sala 2006-an li ser r'ûpelên r'ojnameya «Свободный Курдистан»//“K'urdîstana azad” gotara zanîyar-dîrokzanê r'ûs V. Makarênko ya di wê derbarê da, ku di zimanên r'ûsî û k'urdî da zêdetirî sê hezar p'eyvên hevlêzim (hevbeş) hene, hatye weşandin.⁴

Lê sala 2005-an p'irtûka heman zanîyarî ya «Откуда пошла Русь»// “Ji ku R'ûs destpê bûye” derk'etîye r'onahîyê.⁵ Û di beşê yekem ê vê p'irtûkê da sernivîseke weha heye: «Поиск русских и славянских корней»//“Li dû şopa r'ehên r'ûsan û slavîyan”, û di vê da jî jêrebeşek bi vî navî heye: «Курд = русский»//“Kurd=r'ûs” (r'û: 114 –117). Û li vira Makarênko li ser bingeha danayên dîrokî yê heyî dîtînen zanistî yê p'ir' balk'êş dide pêş. Mirov dikare bi xudanê wan dîtînan r'a ji bo hinek tiştan qaayîl be, yan na, mirov dikare li

⁴ Макаренко В. В., У русского и курдского народов более трёх тысяч родственных слов. Газета «Свободный Курдистан». 2006, № 6 (39)//Макарёно В. В., Gelên rûs û kurd xwedî zêdetirî sê hezar peyvê hevlêzim in. Rojnameya «Свободный Курдистан»//“Kurdîstana azad”. S. 2006, № 6 (39).

⁵ Макаренко В. В., Откуда пошла Русь. М. 2005 г.//Макарёно В. В., Ji ku Rûs destpê bûye. Moskova – s. 2005.

ser hinek pirsan bi wî camêrî r'a bik'êve nava gengeşîyan (û zaniest jî hema bi vê yekê zaniest e!), lê nabe, ku mirov li rex wê r'a derbaz bibe.



Lewra jî, bi wê hêvîyê, ku xwendevanê bi xwe ewê p'irtûka balk'êş bixwîne (şewazê wê yê êlêktronî – pdf di întêrnêtê da heye), em vege'rin ser pirsê mak-zimanê hindewropî yê hevbeş – bêyî t'exmîn û têderxistinên konspêrologî.

Demên cuda gelek şewazên p'eyvî û t'aybetmendîyên r'êzimanî yên hevbeş di zimanê k'urdî û yên hindewropî yên dinê da hatine dîtin û di derbarê wan da lêger'înên zanistî encam dane. Di vê derbarê da

di pirtûka min a navborî da (li nasîya 3. binihêr'in!) nixxandîneke zimanzanî ya berfireh heye. Ê encamên van lêger'înên zanistî û yên dinê dikarin paşer'oja me ya dîrokî ya hemhindewropî r'onî bikin. Lê di nava wan da hebûna p'ir'ek hemşewazîyên p'eyvên r'êhî di zimanên k'urdî û r'ûsî da nixxekî berbiç'av ê zanistî ne.

Ê dema mirov di derbarê p'eyvên hevbeş ên di zimanên k'urdî û r'ûsî da diaxive, divê bê zanîn, ku herdû gelan dê nikaaribûna wan p'eyvan ji hev bigirin, ji ber ku welatên wan herdu gelan bi hezaarê kîlomêtiran ji hev dûr in, û di derbarê pêwendîyên di navbera wan da agahî negihîştine me. Ê, eger heya sedsalaa XVIII çend caran nûnerên leşkerî yên p'adişahîya R'ûsîyayê, an jî diplomat-lêger'îner û mîssîonêr çûne seredana k'urdan, ew nikaribûne bibin bingeh, ku ewqas p'eyvên r'esen ji zimanekî derbazî yekî dinê bibin. Ji bo wê p'ewendîyên p'ir'alî û cihê'eng di demajoyeke dîrokî ya dirêj da dihatin xwestin.

Daneyên dîrokî ne di derbarê cînarîya erdnîgarî ya di navbera gelên k'urd û r'ûs da, hene, ne jî di derbarê p'ewendîyên bê navber û aktiv ên bazirganî-darayî, siyasî, çandî û yên dinê yên di nabera wan da.

Her t'enê dawîya sedsala XVIII û detpêka ya XIX hinek aktîvî di p'ewendîyên navbera herdu gelan da tên xuyan. Lê pêwendîyên wî r'engî nikaribûne bibin bingeh ji bo p'eydabûna ewqas yekşewazîyan di wan zimanan da.

Ê li vira bi xwezayî pirs dertê hole: ewqas yekşewazîyên p'eyvan û t'aybetmendîyên r'êzimanî di wan zimanan da çawa p'eyda bûne?

Encamên lêger'înên hemberhevîkirinî-dîrokî yên di warê zimanên hindewropî da, yên ku heya îro pêk hatine, her weha dîroka pêkhatin û belavbûna wan gelan di cîhanê da û hevbeşîya bingehên zimanî yên destpêkî derfetan didin, ku zimanzanî bersîva van û pirsên dinê bide.

Îro êdî mirov dikare bi bawer bibêje, ku zimanên k'urdî û r'ûsî ne t'enê wek du zimanên hindewropî xwedî bingehê geştî ne. Ê hebûna gelek t'aybetmendîyên r'êzimanî yên hevbeş di herdu zimanan da, di wê derbarê da dibêje, ku di serdemeke dîrokî ya dirêj da ew herdu ziman di nava malbeta zimanên hindewropî ya giştî da li ser bingehê ji bo wan herduyan hevbeş pêşk'etine.

Lê dîsa li vira jî pirs dertên hole: ew bingehê yekê çawa bûye? Wê demê êdî li k'u dimîne, ku k'urdî zimanekî k'oma zimanên îranî ye, lê r'ûsî ê k'oma zimanên slavî? Di k'îjan warên zimên da bingeha hevbeş a giştî yek maye, lê li k'u jihevçudayî li ber ç'avan in? Ew şewaz, ên ku hê dereng p'eyda bûne, li ser çî bingehê pêşketine? Eger ewqas gelek yekşewazîyên bêjeyî û yên t'aybetmendîyên r'êzimanî di zimanê k'urdî da hene, yên ku di zimanên hindewropî yên ne îranî da jî hene, gelo ew nayê wê wat'eyê, ku zanîyar-zimanzan divê hela hê cîyê zimanê k'urdî di malbeta zimanên hindewropî da zelal bikin? Ev hemû pirsana ji bo goveka pirsgirêkan a dinê dimînin û pêdivîya xwe bi bersîvên

bingehîn hene. Û, bi xwezayî, pêkanîna lêger'inên zanistî yên p'ir'alî ji bo vê pirsgirêkê bi serê xwe merckî t'ekî t'enê ye.

Yekşewazîyên p'eyvên r'ehî yên di zimanên k'urdî û r'ûsî da dikaribûn bibûna beşekî mijara lêger'inên pêşer'ojê yên zimanzanîyê, yên ku ez li vira pêşk'êşî bala pisporan dikim.

<u>yên k'urdî</u>	<u>yên r'ûsî</u>
<i>bav</i>	<i>батя</i>
<i>bê</i>	<i>без</i>
<i>beran</i>	<i>баран</i>
<i>ber(- av)</i>	<i>берег</i>
<i>bilqîn</i>	<i>бульканье/вулкан</i>
<i>bira</i>	<i>брат</i>
<i>birû</i>	<i>брови</i>
<i>bit (bibitin)</i>	<i>быть</i>
<i>çar</i>	<i>четыре</i>
<i>çax</i>	<i>час</i>
<i>çima</i>	<i>почему</i>
<i>çors</i>	<i>черствый</i>
<i>ç'êlek</i>	<i>теленок</i>
<i>dar</i>	<i>дерево</i>
<i>deh</i>	<i>десять</i>
<i>derî/çvêr (в диалекте заза)</i>	<i>дверь</i>
<i>diryayî</i>	<i>дранный</i>
<i>dot</i>	<i>дочь</i>
<i>dotin</i>	<i>доить</i>
<i>du</i>	<i>два</i>
<i>ez (личное м - именование I лица)</i>	<i>аз (личное местоимение I лица в древнеславянском)</i>
<i>ga</i>	<i>говядина</i>
<i>gotin (govtin)</i>	<i>говорить</i>
<i>jîn</i>	<i>жена/женичина</i>
<i>ji nûva</i>	<i>снова</i>
<i>jîyan</i>	<i>жизнь</i>
<i>kat</i>	<i>час</i>
<i>kevîr</i>	<i>камень</i>
<i>kit</i>	<i>кот</i>
<i>kuloç</i>	<i>кулич</i>
<i>K'awa</i>	<i>ковать</i>
<i>k'urdi-kî (в диалекте заза)</i>	<i>курдский</i>
<i>lîqîn</i>	<i>ликовать</i>
<i>tak</i>	<i>мать</i>
<i>meh (mange)</i>	<i>месяц</i>
<i>mêş, moz</i>	<i>муха</i>
<i>mêş (a tişteki/keseki girtin)----- √</i>	
<i>(mirov ê) mêşindar ----- → мишень</i>	


<i>mêşingeh</i> ----- ↗	
<i>mişk</i>	мышь
<i>na</i>	нет
<i>ne</i>	не
<i>nig</i>	нога
<i>nizm/nimiz</i>	низкий
<i>nû/nuh</i>	новый
<i>petin</i>	печь
<i>pênc</i>	пять
<i>qalbûn</i>	закаляться
<i>qas</i>	час
<i>qasik</i>	каска
<i>qaz</i>	гусь
<i>qul</i>	укол, уколоть, колоть
<i>r'azan</i>	рожать
<i>r'iz</i>	рис
<i>se(g)</i>	собака
<i>sê</i>	три
<i>sêlav (<sêl + av)</i>	сель
<i>sol(в диалекте заза)</i>	соль
<i>-stan (Kurdistan, gulistan)</i>	стан (станция)
<i>şeş</i>	шесть
<i>şêst</i>	шестьдесят
<i>tenik</i>	тонкий
<i>tirs</i>	трус
<i>tîr (û kevan)</i>	тир
<i>toraq</i>	творог
<i>verg (в диалекте заза)</i>	волк
<i>vir'</i>	врать
<i>vînûten (в диалекте заза)</i>	видеть
<i>westyan</i>	уоставать
<i>xaşîl</i>	каша
<i>zanîn</i>	знание
<i>zewal(a darê)</i>	завалить/завал
<i>zirîçk (a çavan)</i>	зрение, зрачок
<i>zivistan</i>	зима

Evê navnîşê mirov dikare hê jî bidomîne.

Lêbelê, hebûna yekşewazîyan di zimanên k'urdî û r'ûsî da t'enê bi p'eyvên r'ehî yên hevbeş bi sînor nabe.

Di p'irtûka min a navborî da wisa jî di derbarê pirsra yekşewazîyên zimanê k'urdî û yên zimanên dinê yên hindewropî da nirxandineke zanistî ya berfireh heye. Ê hemû mînak û nimûne di goveka wî beşî da ji hêla dîrokî-hemberhevkerinî va hatine hûrbijartin (analîzkirin). Li wira cîyekî t'aybet ji bo yekşewazîyên k'urdî-r'ûsî hatye veqetandin. Ê xwendevanê bersîvên gelek pirsan bibînin, ên ku dibe ku di jîyana r'ojane da li ber heşê wan r'a jî derbaz nebûna. Mînak, di herdu zimanan da ne t'enê gelek p'eyvên r'ehî yên hevbeş, lê wisa jî, t'aybetmendîyên r'êzimanî yên hevbeş hene. Wisa jî di wê derbarê da, k'a bi r'êzimanî çiqasî r'ast e (an jî, çiqasî dikare bê efû kirin, – eger bi dilê we be!), ku

peyvşewazên zimanên rûsî yê wek: **красный, красная и красное** (*krasnîy, krasnaya û krasnoê*) r'engdêr bête hejmartin? ... Û ew sînor li k'u r'a derbaz dibe, yê ku k'urdî, wek zimanekî îranî ji r'ûsî cuda dike, yê ku zimanekî slavî ye? Di vê derbarê û di derbarê gelek pirsên dinê da xwendevan dikrin di p'irtûka navborî da bixwînin.⁶



Lê ezê li vira hewl bidim, di nava goveka derfetên heyî da bersîva van û pirsên dinê bidim.

Îro hatye p'ejirandin, ku t'enê di derbarê p'eyvên r'ehî yê hevbeş ên zimanên k'urdî û r'ûsî da diaxivin. Lêbelê, lêger'înên me dyar kirin, ku hem jî sîstêmên r'engdêran û t'aybetmendîyên r'êzimanî yê navdêran di herdu zimanan da mînanî hev in.

Lêger'înên zimanzanî didin xuyan, ku di r'êzimanên herdu zimanan da p'eyvşewazên wek: **красный, красная и красное**

(kurd. *ya sor, yê sor, yê/yêd sor*), yê ku wek r'engdêr hatine p'ejirandin, ne ewqasî jî (an jî, hîç ne) anegorî qanûnên zimên ên hindurî ne. Ku gotinên di wê derbarê da, xwedêgiravî, r'engdêr zayend. jimar û t'ewanga xwe hene, û di vê derbarê da di r'êzimanên k'urdî û r'ûsî da tê gotin, dûrî r'astîyê ye. Ku ew p'arînk (p'irtik), ên ku di rêzimana r'ûsî da *affiksên r'engdêran* (*affiksên r'engdêrsaz*) tên navkirin, hêç jî ne wisan e...

Wek mînak, em p'eyvebenda makdêrî ya **красная роза** (*krasnaya roza – gula sor*) a zimanê r'ûsî hûrvebijêrin. Eger li vira em r'engdêr, wek ku ew heye, bihêlin (**красная// krasnaya –ya sor**), lê navdêr-makber bi yeke dine biguhêr'in, wê demê emê bibînin, ku dawîng, rasttir, ew, çî ku dawîng tê hejmartin, anegorî wê navdêrê tê guhar'tin, a ku bi r'engdêrê r'a tê danîn: **красная роза//krasnaya roza; красный флаг//krasniy flag; красное яблоко//krasnoe yabloko; красные розы//krasniye rozi**. Eger bi şeweyekî dinê bê gotin, bingeha r'engdêr wek xwe dimîne, lê “dawîng” anegorî zayend û jimara navdêran tên guhartin û zayend û jimara wan navdêran didin zanîn, ne ya r'engdêr (**-ая// -aya** – zayenda mêza, jimara yekane; **-ый// -iy** – zayenda nêrza, jimara yekane; **-ое// -oe** – zayenda navîn, jimara yekane û **-ье// -ie** – jimara p'ir'ane). Di r'êzimana r'ûsî da ev p'arînkana affîk'sên r'engdêr tên navkirin, ên ku zayend û jimarê didin zanîn (?!). Ji bilî vê, anegorî qanûnên r'êzimana r'ûsî tewanga r'engdêr jî heye. Li vira destxweda pirs dertê hole: çî têk'îlîya zayend, û jimarê bi r'engdêr r'a heye? Ma ne, zayend û jimar, wek t'aybetmendîyên r'êzimanî, bi xwezayî yê navdêr in. Heman tiştî mirov dikare di derbarê tewangê da jî bibêje, wek t'aybetmendîya r'êzimanî! Eger zayend, jimar û tewang t'aybetmendîyên r'êzimanî yê navdêr in, wê demê r'engdêr çawa dikarin bête tewngdin û zayend û jimara xwe hebin? Ma, gelo, ev ne li dijî heşmendîya bingehîn a r'êzimana zanistî ye?

Çî dertê hole, di zimanê r'ûsî da r'engdêr jî, mînanî navdêran, tên tewangdin û zayend û jimara xwe hene? Eger mirov anegorî qanûnên hindur'în ên zimên nêzîkî pirsê bibe, divê wisa nîbe. Eger ew wisa tê p'ejirandin, wê demê li vira tişteke ne wisa ye! Her

⁶ Li nasîya 2. binihêre, rû. 77 – 103. Pdf a pirtûkê hûn dikarin bi vê jêderkê bar bikin: https://www.academia.edu/38273718/ГРАММАТИЧЕСКИЕ_КАТЕГОРИИ_СУЩЕСТВИТЕЛЬНОГО_И_ОСНОВЫ_ИНДОЕВРОПЕЙСКОГО_ПРАЯЗЫКА_В_КУРДСКОМ_УОМ_pdf, an jî navê pirtûkê di cîyê lêgerînê da binivîsin.

Pirtûk bi xwe bi zimanê r'ûsî ye, lê di wê da kurtenaver'ok (t'omerîkirin) û pêvek bi ziamnên k'urdî û înglîzî hene.

zimanek qanûnên xwe yên hindur'în hene, û mirov divê anegorî wan qanûnan li t'aybetîyên her yekî ji wan ên sîstêmî binihêr'in, wan binirxînin û derxin zanebûnê.

Têgihîştina heman şewazî ya ne r'ast a t'aybetmendîyên r'êzimanî yên r'engdeêr di nava lêger'înerên zimanê k'urdî da jî heye. Û bi dîtina wana, di zimanê k'urdî da r'engdeêr zayend, jimar û tewanga xwe hene. Û ev dîtina îro di wîjeya k'urdzanîyê da serdest e.

Bingeha vê nêr'îna çewt ji ku tê?

Dema r'engdeêra konkrêt (*sor*) ji p'eyvebendeke konkrêt tê deranîn (*gula sor// красная роза*) û ew jî bi zêdera makdêrî ya *a* r'a tevayî (*a sor*) tê bik'aranîn, ya ku zayend û jimarê dide zanên, ew êdî wek navdeêra konkrêt dertê pêş, ne wek r'engdeêr. Ji wê demê û pêva, dema r'engdeêr bi zêderên makdêrî r'a tîn bik'aranîn, ew di zimên da erka navdeêran pêk tînin, ango, wek navdeêr tîn bik'aranîn.

Pêvejoyeke heman şewazî di zimanê r'ûsî da jî derbaz bûye. Her çiqas li vira, di p'eyvebendên makdêrî (*attribute word combination*) da makdêr pêşdanî ye (*prepositive*), dîsa ew pêvajo, ya ku li jorê di derbarê wê da hate gotin, di zimanê r'ûsî da jî bi heman şeweyî, lê bi şewazekî xwe yê xweser derbaz bûye.

Ji bo ku di wê da bi bawer bibin, em mînaka li jorê ya *красная роза (gula sor)* hûrvebijêrin.

Di vê p'eyvebendê da p'arînkana *-ая (-aya)* p'abendî navdeêrê ye (*poza/gul*) û zayend û jimara wê dide zanîn. Xwendevanê bipirsin: *eger wisa ye, wê demê çima ew p'arînkana bi r'engêran va tîn gotin (dengkirin) û nivîsîn û wek dawînkên wan p'eyvan tîn p'ejirandin?* – Pirs di wê da ye, ku di p'eyvebendên makdêrî da p'eyvên li ser bingeha makdêrî bi hev va girêdayî ne û wek t'oreke p'eyvan a yekgirtî (r'êza p'eyvan a yekgirtî), wek yekîneyeke yekgirtî tîn p'ejirandin (têgihîştin). Û di wê t'ora p'eyvan da werguhar'tin bi bingehîn di dawîya p'eyvan da pêk tîn, lewra ku ew bi hev r'a tîn gotin (p'eyvandin, lêvkirin), û dîraya di navbera p'eyvên wê t'or'e da, bi demê r'a, her ku diçe, tê kutkirin... Pêvajooyeke weha di zimanên dinê yên hindewropî da jî pêk hatye û îro jî pêk tê.

Ev pêvejoyeke dengawazî (fonêtîkî) ya giştî ye, û nimûneyên heman şewazî mirov dikare di her zimanekî da bibîne. Mînakek a vê pêvejoyê jî pêkhatina şewazên îroyîn ên r'engdeêran in di zimanê r'ûsî da, yên ku piştî bik'aranînan wan a di p'eyvebendên makdêrî da pêk hatine. Di p'eyvebenda makdêrî da r'engdeêr bi navdeêrên cuda r'a hatine bik'aranîn, û zayend û jimara wan navdeêran jî bi wan p'eyv-p'arînkana (*ая//aya, уй//iy, ое//oe, ye//ie*) tîn zanîn, ên ku bi wan r'a tîn bik'aranîn (*красн ая роза//krasn aya roza, зелен ое поле//zelyon oe pole, велик ий писатель// velik iy pisatel, добр ые отношения//dobr ie otnoşeniya*). Di axavtina zarkî da (û axavtina zarkî jî berî ya nivîskî hebûye û bêhtir dînamîk e) ew p'arînkana gav bigav bi r'engdeêran r'a bêhtir nêzîk hatine dengkirin, ne ku bi navdeêran r'a, yên ku ew bi xwe p'abendî wana ne. Û bi demê r'a ev parînkên zimanê r'ûsî wek p'arînkên p'eyvsaz ên r'engdeêran (affix) hatine têgihîştin, her çiqas, t'u pêwendîya wana bi wan r'a nînin jî.

Piştî nirxandina wan mînakên li jorê, mirov dikare bi bawer bibêje, ku ew p'arînk, ên ku di zimanê r'ûsî da wek *p'arînkên peyvsaz ên r'engdeêran* hatine hejmartin, zêderên makdêrî ne, lewra ku:

- a) ev p'arînkana, her çiqas li dawîya r'engdeêran va dibin, zayend û jimara navdeêran didin zanîn, û kevnemayên (arxaîzmên) zêderên makdêrî yên r'ûsîya kevnar in;
- b) dema bi r'engdeêr r'a tîn bik'aranîn, ew wana werguhêr'î navdeêran dikin, û dema xwendinê xendevan êdî ji kontêk'stê têdigihîje, k'a ew r'engdeêra konkrêt, a ku p'arînk li dawîya wê va bûye, şûna (û wek) k'îjan navdeêrê tê bikaranîn, an jî bendê dimîne, heta navdeêr jî tê gotin;
- c) di zimanê r'ûsî da dema r'engdeêr, wek beşê navî, k'irdeyê saz dike, ew li wira bêyî wan "*affixsan*" (parînkên p'eyvsaz) tê bik'aranîn (*-ая// -aya, -ый// -iy, -ое//oe, -ье//ie*): *Он был чист и невинен.//Ев рақîj û bê гуneh bû. Наг и бос, пойдешь в царстве небес. // Тууê tazî û p'êxas her'î p'adişahîya asîmanan. Он очень красив.//Ев p'ir' bedew e. Флаг так красен, что!..//Al wisa sor e, ku!..* û yên dine; di

van hevokan da t'aybetmendîyên r'engdêran (yên dazanîna t'aybetî û çawanîya navdêr) hîç kêmekê jî lewaz nabe;

d) dertê, ku di zimanê r'ûsî da ev p'eyv-p'arînkana di pêvajoya pêşvaçûna zimanê a dîrokî da wek p'arînkên p'eyvsaz hatine têgihîştin, lê di r'astîya xwe da ew zêderên makdêrî bûne (*article indikatif*), yê ku bi şêwazên xwe yê awazî va, bi wat'e û bingeha xwe ya bêjeyî (sêmantîkî) va digihîjin zêderên makdêrî yê zimanê k'urdî.

Fermo, bi xwe hemberî hev bikin:

**Zêderên makdêrî yê
zimanê k'urdî**

ya
yê
*(î)
yên/yêd

**Zêderên makdêrî yê
zimanê r'ûsî**

-ая
-ый/уй
-ое
-ые

Eva her t'enê t'aybetmendîyeke r'êzimanî ye! Lê îjar çiqas t'aybetmendî û p'eyvên dinê yekşewazîyên xwe di zimanên hindewropî yê dinê da jî hene û benda lêger'înerên xwe ne?! Û ew jî p'ir'ê caran p'eyvên wisa ne, yê ku zimanê k'urdî nikaribûye ji zimanên hindewropî yê dinê wergirtibin, an berovajî wê.

Û ev ne hemû ye, ev her t'enê destpêk e.

Min li viraa dîtinên xwe yê di derbarê lêger'înen bingehên destpêkî yê hevbeş ên zimanên hindewropî dan zanîn û r'êze yekşewazîyên zop'eyvên r'ehî yê zimanên k'urdî û r'ûsî jî wek mînak anîn. Mînakên weha di zimanên hindewropî yê dinê da jî hene, yê ku pêdivîya xwe bi lêger'înen zanistî hene! Ez hêvîdar im, ku ev pirsgerêk, a ku min destnîşan kiriye, dê hêjayî bala wan zimanzan-lêger'îneran bibe, yê ku pirsên zimanzanîya hindewropî ya giştî va mijûl dibin, û dê bibe bingeh ji bo govtûgoya zanistî û hevkarîya pisporan a berhemdar di vî warî da.

LI ŞÛNA PAŞGOTINÊ

Di cîhanê da gelên cuda hene, yê ku bi hezarsalan di heman herêmê da dijîn, cînarên hev ên nêzîk in, heya di hinek deveran da nûnerên wana di nava hev da dijîn. Di dîrokê da efrandidinê gelêrî yê hevbeş ên wan gelan tên zanîn, lê yekşewazîyên t'aybetmendîyên r'êzimanî yan ên p'eyvên r'ehî di zimanên wan gelan da nayên zanîn. Û, heya eger hinek p'eyvên hevbeş di zimanên wan da hebin jî, ewana di nava demê da ji zimanekî derbazî yê dine bûne. Lê gelên r'ûs û k'urd, her çiqas bi hezaran kîlomêtran ji hev dûr dijîn, di zimanên wana da p'ir'ek hemjêwazîyên t'aybetmendîyên r'êzimanî û yê p'eyvên r'ehî hene. Wek ku li jorê jî hatye gotin, zanîyarê r'ûs ê serdema me V. Makarênko dinivîse, ku di zimanên k'urdî û r'ûsî da zêdetirî sê hezar p'eyvên r'ehî yê hevbeş hene.⁷

Û tişteki dinê yê balk'êş jî: r'onaydarê ermenî yê mezin Xaçatûr Abovyan dema di derbarê govenda k'urdî da dinivîse, dide xuyan, ku ew mîna xorovod (govend) a r'ûsan e.

Balk'êş e, ne?! K'urd ji bo ermenîyan ne net'eweke nenas in, ewana hezarê salan cînarên hev ên nêzîk bûne, lê nivîsk'arê ermenî govenda k'urdan mîna xorovoda gelekî dinê (ê r'ûs) dike, yê ku bi hezar kîlomêtran ji wan dûr dijî!

Û ev jî aspêkteke dinê ye ji bo lêger'înen bingehên destpêkî yê hevbeş ên zimanên hindewropî.

Ji bilî vê, zimanê k'urdî û K'urdistanê r'êzek navên net'ewan û yê warên erdnîgarî p'arastine, û lêger'îna wan jî dê ji bo zanebûna paşer'oja me ya hemhindewropî derfetên nû derxe hole. Weha:

—Di K'urdistanê da berek (eşîr) a

⁷ Li nasîya 3. binihêrin.

kurdan a *tîrahî* heye.

– Di Afxanistanê da zimanê *tîrahî* heye, yê ku yek ji zimanên k'oma zimanan a hind-îranî (zimanên dargî) ye, ya ku digihîje şaxê zimanên hindî (hindaîyî).

– Di K'urdistanê da bereka (eşîr) a k'urdan a *sîndî* heye.

– Di qeza Sîndh a Pakîstanê û herêmên Hindistanê yê Maharaştra, Gûcarat û Racasthan da gelê *sîndh* (sînd) dijî, û zimanê wan jî *sîndhî* ye.

– Di K'urdistanê da bereka (eşîr) a k'urdan a *alan* heye.

– Di Osêtîyayê da berek (eşîr) a *alan* heye. (Osêtîn jî, mîna k'urdan, gelekî îranî ne).

– Di bakûrê K'urdistanê da navçeya bi navê *Dîgor* heye.

– Di heman Osêtîyayê da berek (eşîra) a *dîgor* heye.

Û di dawîyê da – bi vê boneyê.

Dibêjin, ku Navç'emk (Mêzopoamya) dergûşa pêkhatina gelên hindewropî û şaristanîya hindewropî ye. Îro k'urd û K'urdistan, hebûna zimanê k'urdî, çanda net'ewî ya gelê k'urd û p'arastina bingehên destpêkî (*sûbstrat*) yê mak-zimanê hindewropî di zimanê k'urdî da di wê derbarê da govenyê didin. Her çiqas gelên hindewropî di t'evahîya cîhanê da belav bûne, di gelek destpêk û nîrxên hevbeş da, yê ku wana bi xwe r'a birine, guhartinên cuda pêk hatine, lê di welatê wan ê dîrokî da gelek şopên bingehên destpêkî yê hindewropî hatine p'arastin.

Û divê di nava k'urdan di K'urdistanê da li hemû şopên wan bingehan biger'in.

Jixwe ev jî di warê hindewropîzanîya giştî da bi serê xwe aspêkteke girîng e ji bo lêger'inên zanistî yê ji vir û pêva.

Piştî vê nîrxandina li jorê em pîrsa di wê derbarê da, k'a gelo mirov dikare van hemûyan di govek konspîrologîyê da r'avebike, ji xwendevan r'a bihêlin.

A. Mamoyam (Ezîz ê Cewo)

R'ezbera s. 2021.

https://www.amidakurd.net/ku/tekst/BILA_KONSPIROLOGÎ_JI_KONSPIROLOGÎ_YÊ_R_A_BIMÊNE_LÊ_DIVÊ_NEYÊ_JIBÎRKIRIN_KU_KESEKÎ_ZANIST_BETAL_N_EKIRYE_1

<http://dirokurd.blogspot.com/2021/10/pewendiyen-rus-u-kurdan-li-gel-zimane.html>